

**GOTINÊN PÊŞIYAN
DI ÇANDA GELAN DA**

**Wergerî û berfireh kirin:
Îsmet YALVAÇ**

Çapa Yekem

Îlûna 2005

Wargeha Mexmûr

NAVEROK

Peyvek.....	9-10
Av	11
Agir	12
Aşti.....	13
Bab.....	14
Bazirgan	15
Bazirganî.....	16
Çav.....	17
Çavtengî	18-19
Çûçik	20
Difin.....	21
Dijmin.....	22
Dost	23
Dest.....	24
Didan.....	25
Delîve.....	26
Dadwerî.....	27
Deyn.....	28
Dayîk.....	29
Edet	30
Fîl	31

Gurg	32-33
Ga-Çêlek.....	34
Hîvî û arezû	35
Hesp	36
Hêştir	37-38
Hedar.....	39
Kêtik	40-41
Lez	42
Mêr.....	43-44
Mal.....	45-46
Mêhvanî.....	47-48
Mû	49
Mar	50-51
Mar	52
Nan.....	53-54
Nefret.....	55
Neamadebûn.....	56
Pere.....	57-58
Per	59
Pê	60
Qazî.....	61
Rûvî	62-63
Ser	64-65
Se.....	66
Soz	67
Şîyar	68
Şer	69
Şans	70
Tirs	71
Wîjdan	72
Xwîn	73
Xwe kujtin	74-75
Xwazok	76

Xwazok.....	77
Xwê.....	78
Yasa	79
Zivistan	80
Zewac	81
Pendên hemereng.....	82-85
Wateya hindek pendên Farisî.....	86-97
Ferhengok.....	98-103

PEYVEK

Ev berhemê di destê we da wergerandiya pirtuka (MESELHA VE ENDÎŞEHA) bi zimanê farisî ye kû ji nîvîsîna rêzdar (ERDEŞÎR Ê GEWS)e.

Ev pirtûk di rastiye ji dûdû beşan pêk hatibû:

Beşê yekem (MESELHA = Gotinên pêşya)û beşê duwem (ENDÎŞEHA = Hîzîr û bîrên zanayan)

Herçend ew derfet tunebû kû em destûrê ji rêzdar nivîskarê pirtûkê bigirîn jibo van guhertinên teknîkî kû ji aliyê wergêr ve hatine kirin Lê armanca me ji berfireh kirin û dewlemendiya pirtûkê bûye ,bêy kû di warê yasaya wergêran û destpakiya nîvîsandinê da em guhûran yanjî kêmasiyekê bikên.

Bi giştî guhûranên teknîkî kû ji layê wergêr ve çêbûne bi awayê jêrin:

1. Pirtûk di dû beşên cuda da wekû dû pirtûkan hatiye wergerandin .

2. Navê beşê yekem kû (MESELHA) ye di wergerandina Kurdî da bûye

(GOTINÊN PÊŞIYA DI ÇANDA GELANDE) kû naveroka pirtûkê dîsan parastiye .

3. Li beramberê gotinekê pêşya ya her mîletekê , di demê pêwîst da ew gotin di zimanê Kurdî da jî li perawêzê hatiye zêde kirin.

Li gori alfabaya Latînî ,pêrîst jibo mijaran hatiye amade kîrîn.

Gotinên Pêşîyan Di Çanda Gelan Da

Li dawîya pirtûka yekem jibo baştir
têgehiştinê,ferhengokek hatiye amadekirin.

Hîvîdarim bibit cihê sûdgirtin û rezamediya gişt
xwedewarên delal .

Îsmet Yalvaç
Îlûna 2003

AV

-(Wextê bîr çika, wê bihayê avê bê zanîn)

Skatlendî

-(Kesê kû jîboy avê jî mûn bit , bimirit baştire)

Hindî

-(Av herçiqasê giran biha jî bit, demê genî bû ,divê bêt rêhtin .) Çînî

-(Her çiqasê kaniya avê durtirbit , tû gavên xwe dirêjtir bike.) Efrîqî

-(Mirov ji avê çêdibit,lê bi nanî zindiye.)

Japonî

- (Ava di cuwê da çûyî ,êdî navegerit.)

Farisî

-(Dilopa avê, kevir kun diket.)

Rûsî

-(Av û agir ,ji her tiştê baştir cihê xwe vedikin.)

Elmanî

-(Ava boş ,dengê wê kême .)

Hindî

-(Ava rawestayî,aşî nagerînit.)

Spanyolî

(*) -(Ava zordaran ber jor diçe)

-(Av ji sere kaniyê şêlûye)

-(Ava bin kayê ye)

-(Av disekini,dijmin nadekini)

-(Avê li wi destî bike ,yê destê te bişût)

-Av di cihê teng da deng dide.

-Ava sekinî, bêhn jê tê)

-(Ava boş, deng jê nayê .)

AGIR

-(Vêxistina agir sanahiye, lê vemirandina wê zehmete)

Yewnanî

-(Ji xweliya li ser agir, xiyalneke kû vemiriye .)

Frensî

-(Çirûskek biçûk, agirek cîhansoj diafirîni.)

Frensî

-(Agir û pembû bi hev ra nasazin.)

Hindî

-(Yê dîn agir vêdêxit, aqıl wî divemirînit .)

Ingîlîzî

-(Agirê kêr, ziyana wî zêdeye .)

Îtalî

(Dîjmin agir xweş dike û dost avê lê dike.

Yewnan

(Agir bi kulûvila ve dimîni .)

AŞTÎ

-(Wextê dijmin li ser aştiyê axivî , tû xwe amadeyê şer bike .)İnglizi

-(Bi aşti-aştî gotinnê, kû aşti pêknayê .)

Îtalî

-(Eger şûrê te tîj bit ,aşti xwe bi xwe pêktêt .)

Erîqî

-(Aştiya despêkê ,baştire ji şerê dawiyê .)(*)

Farisî

-(Parastina aştiyê, ji pêkanîna wê zortire.)

Îtalî

-(Eger aşti hebit, hemû wê pîr bimirin.)

Ferensî

-(Şerê sibê ,baştire ji aştiya êvarê .)

BAB

-(Bab herçiqasê pîr jî bit, hebûna wî baştire ji ne bûna wî.)

Îtalî

-(Eger dixwazî bizanî babê te çiqasî zehmet ber te da biriye ,jinê bine û bibe xwedî zarok .)

Frensî

-(Wextê te zarokê xwe himbêz kir ,tû dê bihayê baboy bizanî.)

Înglîzî

-(Bab jibo kurên genc wekû qaziyekê sextgîre.)

Yewnanî

-(Kesê kû ji babê xwe ra rêzdar nebit , ne cihê baweriyê ye .)

İnglîzî

(Kesê kû ji babê xwe ra rêzdar bit , wê temenekê dirêj hebi)Ferensî

-(Ewlad di zarokatiyê da ,babê xwe têgehiştîrîn kes û di temenê cuwaniyê da ehmeqtîrîn kes dizanin, lê demê ji sih saliye bûrî , nû nirx û giraniya babê xwe nas diken .)

Yewnanî

BAZIRGAN

-(Pereyê bazirganî ji ehmeqiya kiryarî zêde dibit.)

Amerîkî

-(Pere xwêya jiyana bazirgane.)

Yewnanî

-(Bazirganê bê pere û serbazê bê tifeg ,pîvazekê nahêjin)

Elmanî

-(Eger zarok camê neşkînit ,bazirgan wê ji birsan bimirir)

Îtalî

-(Bazirgan dijminê bazirganane , welew birayê wî bit .)

Ingîlîzî

-(Bazirganê bazarê , bazîrganê dilêşe.)

Erebî

-(Bazîrganê kû kirîn û fîrotina hertiştê biket,wê
niyazmendê nanê şevê bibit.)

skotlendî

BAZIRGANÎ

-(Di bazirganiyê da , bes kesên ehmeq zîyanê dibînin)
Înglîzî

-(Kesê kû karê wî bazirganî bit, her cih cihê wî ye)
Frensî

-(Demê te bazirganî kire pêşeya xwe ,dê rezîlî bibit siha te)
Elmanî.

-(Eger tefşû neşkê û pertal neqetit ,manê bazirganî rêve
naçit.)

Skotlendî
(Bazirganî ,dayîka peraye)

Înglîzî
-(Eger te zarok fêrî bazirganiyê nekir,dê fêrî diziyê bibit.)
Macaristanî

-(Eger tevayê bazirganiya te jibo kesekê dî bit ,wek wi
dimînekû gihanê çêla xwe di menciloka yekê dî da
bidoşî.)Avusturalî

ÇAV

(Çavê kû her tiştî dibînit, ji dîtina xwe natewane .)

Elmanî

-(Bihistin, kengî dibi weke dîtine .)

Farisî

-(Carek dîtina bi çav, baştire ji sed car bihîstina bi guh

Japonî

-(Ji çav zêdetir, ji guh bawer bike .)

.Çînî

-(Tiştê kû çav nebînit,dil naxwazit.)

Macarîstamî

-(Çav dibînit û dil dixwazit.)

Farisî

-(Çavekê rohnî baştire ji duyên tarî.)

Ingilizî

-(Bi çavekê li jor dinêri û bi yê din li jêr)

Skatlendî

(*) -(Çavê kû nebînit, yê derxistinêye)

(Çiya bi çiyay nekevit ,çav bi çavan dikevit)

ÇAVTENGÎ (Hesadet)

-(Jina çavteng, agir bi malê dêxi .)

Ferensî

-(Çavtengî û ehmeqî ,her dû hevpaye ne .)

Danimarkî

-(Çavtengî yekemîn derse şeytane jibo mirovê ehmeq)

Ferensî

-(Mirovê çavteng,kûre.)

Erebî

-(Ew ji dîkilî jî çavtengîtire .)

Rûsî

-(Çavteng ,qet asûde nabit.)

Farisî

-(Ji çavtengiyê bes yêk berhemê baş di gehit xudanî, ew jî hêdî hêdî tunebûna wî ye)

Inglîzî

-(Jeng asinî dixwi û çavtengî dilî .)

Ferensî

-(Supas ji Xudê re kû kesê çavteng bes dikari bi tiştên dîtînî çavtengiyê biket .

)Spanyolî

-(Kesê çavteng û kesê temah, qet têr nabin .)

Amerîkî

-(Kesê kû li hemberê yê çavteng bê xem bit,yan gelek dilvekiriye,yan jî ji hesin çêbûye.)

Inglîzî

Gotinên Pêşîyan Di Çanda Gelan Da

-(Tîra kû çavteng davêji kesên dî ,ber bi wî bi xwe ve vedigerit.)

Elmanî

-(Çavtengî çi carê kesekê dewlemend nakit.)

Îtalî

-(Her kesê çavtengêk nîne ,navdengêk nîne.)

Îrlandî

ÇÛKÇIK

- (Çûka neqd ,baştire ji tawusê bi deyn)
- (Ma çûk kengî digehite teyrê baz?)
- (Çûkek di dest da , baştire ji sedên di hewa da.)
- (Çûka qelew tûyek sax daûrt û demê mezin bû garisî tûvil diket .)-(Çênabi çûk daxwaza hêlîna baz biket .)
- (Wekû çûkê jiyan .)
- (Çûke û arezûya axaftina bi şahînê ra dike .)
- (Wey jaro! di tune kirina canê xwe da çendê bi leze.)
- (Bez ne di zekê çûkê daye , di zikê gayê da komdibit.)
- (-)-(Xweyê van pendan nediya, lê dibe kû girêdayê çanda gelên Îranî bin. (wergêr)
- (*)(Her çûkek hejîrxwer bûya, hejîr bi darê ve nediman.)

DIFIN –KEP

-(Berî kû di difina xwe da, zarî axaftina dîtiran vekî ,difina xwe paqij bike.)

Înglîzî

-(Kesê kû difina xwe bi hûçkê xwe paqij biket,ne cihê baweriyêye)

Yewnanî

-(Dîbêjî ji difina filî ketiye)

Farisî

-(Mêr,mêre herçend kû difina wî li ser serê wî bit)

Rûsî

-(Difina hemû kesê ne yek core)

Înglîzî

-(Xudanê difina momî ,nabit li pêşiya sobê rûnit)

Elmanî

-(Difina wî bigirî , canê wî diçit)(*)

Farisî

(*)-(Serê difina wî bigirî , wê ruhê wî derkevit)

DIJMIN

-(Dijminek ,karê sed dostan vala derdêxit)

Yewnanî

-(Dijminê zana, ji dostê nezan baştire)

Farisî

-(Ji dijminê kû neyartiya xwe li pêşberê te diyar deke ,netirse.)

Îtalî

-(Dostekê nûhatî kû ji rade bider dostîniyê nîşan bidet,nedûre kû dijmin bit)

Inglîzî

-(Lêva cilêtê û lêva dijmin herdû birekin)

Yewnanî

-(Rondikên dost ji kena dijmin baştire)

Inglîzî

-(Dijminek jibo heft piştê mirov bese)

Farisî

-(Dijminê îro,sibê wê bigezit)

Firansî

-(Dijmin bi dijmin ra dibit yek)

Skatlendî

-(Dijmin hertim li peye û dost sed qonaxan dûre)

Erebî

DOST

- (Dostê herkesê ,ne dostê kesê ye)
Rûsî
- (Ji dostê xwe hez bike ,lê hişyarê xwe be)
Skatlendî
- (Dost eger li dojhê jî bit başe)
Yewnanî
- (Dostek karê sed dijminan dike)
Ferensî
- (Dost eyneya serkeftina te ye)
Inglîzî
- (Dost dizê zemanê)
Skatlendî
- (Dostê tengiyê ,dostê raste)
Inglîzî
- (*)(Dostê te çend ji şîrîn bit, hemûyê nexwe)
(Dost bigire beqespêk,berî mede be espêk)
(Dost ewe te bigirînit ,dijmin ewe te bikenînit)
-(Mar ji dostê bê wefa baştire)
Erebî
- (Dost ewe kû di tengiyê da destê dostê xwe bigirit)
Farisî
- (Qaza reş û gayê spî kû pir kêmin , zûtir ji dostekê baş
peyda dibin)
Qibrisî

DEST

- (Destê rastê gelek karan diket,lê newêrit wana binivîsit)
Çînî
- (Dest kû zêde bûn ,kar sivik dibit)
Înglîzî
- (Manê bi destê vala naçin şerê şerî)
Efrîqî
- (Destê sar,nîşana dilê germe)
Elmanî
- (Dest ji pê dirêjtir)
Farisî
- (Bi dest li ser dest danînê kû kar birêve naçit)
-(Her wextê got ez gizar cardestê te maçî bikem, bizane kû
gisavê kuştina te kiriye)
Îtalî
- (Bi destekê çênabit dû zebeşan rakî)
Farisî
- (Deng ji destekê nayêt)
Farisî
- (Destê tinê ,deng jê nayê)
(Destê mandî li ser zikê têre)
(Dest dizanît kîder dixurît)
(Destê neyêt birîn,tê ramûsan)
(Nava destî reş nebit, tama devî xweş nabit)

DIDAN

-(Yê kû didan didet ,nan jî didet)

Farisî

-(Parî çî hişk bit û çî nerm,wê her ji nava didan bibûrit)

Skotlandî

-(Didanê temahiyê kêşaye)

Farisî

(Zarokê kû didan derêxit ,wê memkê dayîkê bigezit)

Spanyolî

-(Didanê kû tişteke jibo cûtinê tune bit ,bêmifaye)

Çînî

-(Didanekê kirmî , baştîre ji heftên çêkirî)

Feransî

-(Eger tû nikarî bigezî ,didanê xwe nîşanedz

Inglîzî

-(Yasa gelek caran didanê xwe nîşan didet ,lê nagezit)

Inglîzî

(Didan êşan, derman kêşan)

DELÎVE

-(Divê pêşa delîveyê bigirî û peşve biçî)

Ferensî

-(Delîveya baş ,pêlekana bexteweriya zanayane)

Yewnanî

-(Kesê kû ji delîveyan mifayê nabînit ,hertim bi zor û zehmetiyan ra rûbirûye)

Îtalî

-(Di şer da ,hertim delîve di berjewendiya yê aqil da şer deke)

Inglîzî

-(Mirovê jîr ,delîveyek baş dikite bextekê baş)

Yewnanî

-(Delîve bin pêyan ketiye,destê xwe pêşve bibe wê rake .)

Ingilîzî

-(Hêz bi delîvê raye)

Çînî

-(Eger şêr delîvenas nebûya, nedibû şêr)

Efrîqî

-(Nanê jiyanê, hevîrê wê pêkhateke hi arê delîvê û ava eqilî)

Yewnanî

DADWERÎ

-(Dadweriya rast ,asûdeyiya wêjdanê bi xwe ra tînit)

Inglîzî

-(Dadweriya rast ,hunere)

Yewnanî

-(Ezê li gorî tiştê ji devê te derdikevit ,derbarê te dadweriyê bikim)

Çînî

-(Dadwerê kû gotinên aliyekê tinê guhdarî biket,guhdarî tişteke rast nekiriye)

Inglîzî

-(Tevayê dadweriyên giştî, dest têwerdanên nerastin)
Ferensî

-(Dibi kû mirov her cor şaşîtiyeka xwe bînit ziman ji bilî daweriya xwe ya şaş.)

Yewnanî

-(Zanist sermaye ye ,lê dawerî embardarê mirovê aqile)

Inglîzî

-(Çi car derbarê kesekê dadaweriyê neke, meger tû xwe danî cihê wî)

Yewnanî

-(Kesê kû derbarê dîtiran dadweriyê diket ,xwe gunehbar kiriye)

Îtalî

(Civaka bê dad,nikari bijî)

DEYN

-(Deyn dêweke kû eger siha wê kete serte ,êdî paş ve naçit)

Rûsî

-(Deyn xureya temene)

Italî

-(Kesê kû bi pereyê deyn mêhvaniyê bidet ne ji ehmeqekê zêdetire)

Ibrî

-(Bextewerew kese kû deynên wî tunebin)

Inglîzî

-(Hertim deynên mirovê destteng deng jê têt)

Spanyolî

-(Dey zincîra êxsîriyê ye kû em bi destê xwe dêxîn stuwê xwe)

Inglîzî

-(Deyn qesreke dagirtî ji bela û belengaziyan)

Îtalî

-(Deyndarî jenga mêraye)

-(Mirov ji rûyê izrayilî zêdetir ji rûyê xweyê deynan xweşa wî têt)

Amerîkî

-(Şerm roja paştir têt ji bîrkin, lê deyn hertim dimînit Çînî

DAYÎK

-(Di nava kesên kû digirîn,girîna dayîkê xuya ye) Erebi

-(Mala bê dayîk tariye)

Inglîzî

-(Yê dayîkê dil dişewete û dayê etek)

Farisî

-(Keçê bine û dayîkê binase)

Îtalî

-(Demê dayîk nîne,divê bi jin babê ra lihev bikî)

Îranî

-(Di dunyayê da bes yek jinbaba baş heye ,ew jî di tabûtê da ye)

Skotlandî

-(Mêwê ji axa baş û keçê ji dayîka baş hîlbijêre)

Çînî

-(Beheşt di bin piyê dayîkan daye) (**)

Erebî

(Dayîkê bibînê û keçê bixwaze)

-(Ne destê çekirî karê dest dike û ne jinbab karê dayîkê.)

Nerwiçî

Ez dibêjim ne tinê beheşt di bin piyê dayîkan daye, belkû dojah jî

Amerîkî

EDET

-(Dev jêberdana edetê ,dibi sedemê nesaxiyê)

Farisî

-(Edet xwîşka kiryarê ye)

Ibrî

-(Edet berjengê duwemîne)

Yewnanî

-(Edet di serî da dostê mirove û paşê dijminê wî)

Inglîzî

-(Bes edetekê nû ,edetekê kevin ji holê radike)

Mecaristanî

-(Edet kirin bi baştirîn karanjî, ziyan hênere)

Ferensî

-(Êxsîrê edet bûnê ,ne hêjayê jiyanê ye)

Erebî

-(Edet û îrade hertim bi hev ra di şerdanin)

Hindî

-(Edet pilekana dogehê ye)

Merakişî

-(Edetê kû te di demekê dirêj da girt ,tû nikarî di demekê kurt da ji xwe dûr bikî)

Ibrî

-(Eger te karî edetê ji xwe dûr bikî , biserkeftina xwe hîvîdarbe)

Inglîzî

FÎL

- (Çekuçê evqas biçûk, filê wusan mezin ehldike) Hindî
-(Demê tû suwarê filî bûy ,herçiqasê direw ji bikî, kes nabihîsit)
Efrîqî
-(Li ser piştê filê zirt û pirt kirin sanahiye)
Hindî
-(Fîl çî zindî û çî mirî, sed tûmenan dihêjit)
Farisî
-(Fîl û jin çî carê xirabiya mirov jibîrnakin)
Swîdî
-(Min filê te dît û xertûma wî jî dît ,êdî çî dibêjî !)
Ferensî
(Eger di şerekê da fil tune bûya ,wê gamêşê gelek zirtên xwe bikira)
Efrîqî
(Niha kû tû suwarê filêy û ez peyade)
Çînî
(Di têr kar kirin û kêmeqliyê da,gelekê ji filî kêmtir nîne)
Elmanî

GURG

-(Kesê guhê gurgî di destê wî da ye, ne dikarit ta dawî bigirit ,ne jî diwêrit berdet)

Yewnanî

-(Mih ji gurgê ditirsit û gurg ji seyê)

Elcezîreyî

-(Gurg didanê xwe didet, lê dijminahiya xwe ji bîr naket)

Îtalî

-(Ew gurgekê baran dîtiye)

Farisî

-(Demê te zincîra seyê vekir, gurg hisaba karê xwe diket)

Elmanî

-(Gurgê razay,hişyarmeke)

Rûsî

-(Kesê kû bi gurgî ra mezin bibit ,dizanit kengî û çawa bilûrînit)

Inglîzî

(Gurgê har, temenê wî çil roje)

(Gurgê baran dîtiye)

-(Gurg û mih ji cuwekê avê vedixun)

Farisî

-(Gurgê kû eşkere ber bi kerî ve bêt ,wê berxekê bibet,lê gurgê kû xwe bi rengê mihê nîşan bidet, wê çend mihan qet û parî biket)

Hindî

-(Yê ji gurgê bûyî, wê her gurg bit)

Gotinên Pêşîyan Di Çanda Gelan Da

Farisî

-(Gure di postê mihê da)

(Gurg û mih bi hev ra dijîn)

-(Gur pê xwe, bizin pê xwe ,her kes û emelê xwe)

GA –ÇÊLEK

-(Eger tû gayê bînî mêhvanxanê jî, dîsan wê vegerit govê)

Ferensî

(Gayê wî kêrûşkan digirit = gelek xwedî şanse)

Elmanî

-(Gayê kû kêrûşkan bigirit ,pir bihaye)

Çînî

-(Wekû gayê enî spiye)

Farsî

-(Çêleka sor, şîrê wê zêdeye)

Inglîzî

-(Demê te çêl firot,şîrê wê ji destê te diçit)

Elmanî

-(Xudê şaxên kurt didete gayê hov)

Macarî

-(Demê şîr erzan bû kes çêlê nakirit)

Holandî

-(Bes xweyê gayê dikarit hişk duvê wî bigirit)

Inlîzî

-(Divê tû goştî ji kêleka gayê bibirî)

Farisî

(Gayê navçav beleke)

(Çêlekek rîxo,garanekê diherimînit)

HÊVÎ Û AREZÛ

(Eger hîvî nebûya ,wê jehra bêhîviyê sed car mirov
bikuşt)

Îranî

(Hîvî tiryaka her derdekê ye)

Erebî

-(Arezû jibo cuwanan ne şerme)

Farisî

-(Hîvî û arezû dû hevserên mirovin ji dergûşê ta gorê)

İnglîzî

-(Jiyan seranser pêkhateke ji arezûyan)

Misrî

-(Di demê mirinê da,arezû zindî dibin)

Îtalî

-(Eger hîviya yê girtî nebûya ,qet zindî nedima)

Elmanî

-(Jibo arezûyan dawiyek tune) Hindî

-(Weyla li halê kesekê kû tovê hîviyêdî wî da bimirit)

Îtalî

-(Arezûya bi cih nehatî,hertim mirovî di êşînit)

Ewustralî

(Hîviya dera,xweliya sera)

(Yê bi hîviya cîranî ve bit wê bîrsî serê xwe danit)

HESP

- (Hespê erebanekêş, alifek zêde di xwazit)
Ferensî
-(Eger tû suwarê hespê bilind bûyî ,hizra peya bûnê jî bike)
Inglîzî
-(Bi hespê ji karketî kû şekrokan nadin.)
Elmanî
-(Hespê cîranî barî zêde dikêşit)
Ferensî
-(Hespê xweşro barî nakêşit)
Skatlendî
-(Hespên me nikarin di govekê da bimînin.)
(xûyê me bi hev ra nesazigare)
Holendî
-(Hespê kû tû dixwazî kirê bikî ,carekê lê suwar be. paşê)
Inglîzî
-(Demê suwarê hespê bûyî ,hizira peyadeyan jî bike)
Erebî
(Pa ew hespê spiyê te digot kanê ?)
(zêde zirtên xwe kirin) Megolî
(Hespê beza têr xore = xweraye)
(Hesp û hêstir li hevketin ,kerê feqîr nav dest û piya da seqet bû

HÊŞTIR

-(Yê bixwazit hêştiran binit mala xwe ,divê serdera xwe bilindtir biket)

Erebî

-(Her tebayekê stûdirêj kû nabite hêştir)

Erebî

-(Hêştir eger birsî jî bit ,ji deh keran zêdetir bardibet)

Hindî

-(Hertim hêştira pîr ,kevilê hêştira cuwan dibete bazarê

Çînî

-(Hêştir hêdî diçit ,lê rêyek dirêj diqetînit)

Înglîzî

(Hêştir hêdî diçit şev roj)

Farisî

-(Li birkê, avê bide hêştirê, ew wê li çolê bi sanahî suwariyê bidete te .)

Erebî

(Suwariya hêştirê kû ev mil û ew mili naxwazit)

Farisî

(Hêştir sanahîtir di kuna derziyêra dibûrit heta zelumê zengîm ji derwazeya rastiya xudê perestiye)

-(Hêştira kû arezûya şaxan biket ,wê stuwê xweji dest bidet)

Yewnanî

Gotinên Pêşîyan Di Çanda Gelan Da

-(Hêştir wunda kiriye, li pey hefsarê wê digêrit.)

Farisî

(Waştir ne besî bû barî giranî, wa zengoleşî xira milanî)

(Yê hêştiran xweyî bikît , divê serdera wî bilind bit)

HEDAR (SEBIR)

- (Hedarî dermanê her derdekêye)
Erebî
- (Hedar çiyay ji cihê xwe radiket)
Ibrî
- (Roja kû hedar li bostanê jiyana te şîn bû ,bi jêkirina fêqiyê serkeftinê hivîdarbe)
Elmanî
- (Êş jibo mirovê bi hedar bê wareye)
Inglîzî
- (Hedar bilindtirîn hunere)
Spanyolî
- (Ji aciziya zelumê bi hedar bitirse)
Yewnanî
- (Hedar guleke kû di her baxçeyekê da şîn nabit)
Erebî
- (Ger bi hedar bî ,wê ji bisîrkey, (*) helewê çê bikî) Farisî
- (Bihayê zelamekê bi hedariya wiye)
Inglîzî
- (Bisîrke: tiriye şîn û negehiştîyê kû gelek tîrşe,(wergêr)

KÊTIK- PIŞÎLE

-(Kêtika kû lepikê bikete destê xwe,nikarit mişkan bigirit)

Ferensî

-(Kêtik newêrit di kuna şêrî da mişkan bigirit)

Rûsî

-(Eger kêtik lêvara deryayê bibînit, hergîz di deryayê da naxeniqit)

Hindî

-(Tû kêtikê ji her milê ve bavêjî ,wê liser pencên xwe bikevit)

Elmanî

-(Kêtika pîr qasê kêtika cihêl şîr dixwet)

Ferensî

-(Kêtika reş ciniye)

Farisî

-(Nesîbê kêtikeka baş ,mişkek qelewe)

Macarî

-(Eger destê kêtikê negehit goştî ,dibêjit pîf pîf bêhn jê tê)

Farisî

-(Demê goşt di zembîlê da ji banî hilawîstîbit, kêtik heywanek şêrîfe)

Swîdî

-(Ji wî kesê baş dizanît çawa kêtikê kevil biket ,bitirse

Amerîkî

Gotinên Pêşîyan Di Çanda Gelan Da

-(Deriyê qazanê vekirî ye ,heya kêtikê kîve çûye?)

Farisî

-(Kêtika heft rihe)

-(Kêtik ne li male , navê mişkê Evdirehmane)

-(Pişîle le malniye ,mişkan tilîliye)

LEZ (ECELE)

-(Lez û eqil bi hev ra sazigar nabin)

Inglîzî

-(Mirovê lezok dijminê serê xwe ye)

Îtalî

-(Mitovê lezok çayê bi çetelê vedixwet)

Çînî

-(Mezintirîn şaşîti ,lez kirin di zewacê daye)

Ferensî

-(Lezandin dibi sedemê zîyanê û zîyan sedemê bextreşiyê

)

Inglîzî

-(Lezandin karê şeytane)

Farisî

-(Lez babê tune kirina serkeftinê ye)

Inglîzî

-(Lezkirîn ,leyîstina bi agire)

Ferensî

-(Di lezandina mirovê ehmeq da ,xweş çûn tune ye)

Inglîzî

MÊR

-(Eger dixwazî insiyatîfa mêrê xwe bigirî dest, insiyatîfa zikê wî bigire dest)

Amerîkî

-(Jin û mêr eger hevdû bi xwazin , dikarin di kolke xirbeyeke da jî bijîn.)

Hindî

-(Natewantirîn mêr, demê mesela namûsê tê meydanê, ji her heywanekê bihêztire)

Ferensî

-(Mêr û zebeş nayên naskirin)

Inglîzî

-(Jina baş û guhdar û qanii, mêrê xwe yê hejar dikete paşa)

Farisî

-(Mêr biçîte karwanserayê, nanê wî dê bête qesrê.)

Îranî

(*) (Mêr hene , mêr kok ji hene)

(Mêrê bi xeberê jinê , îflah nabe li dinê)

Gotinên Pêşîyan Di Çanda Gelan Da

(Mêrê baş di tengiyê da diyar dibit)

(Mêrê xwe yê dû jinan ,îflah nabe tu caran)

(Jin û mêran şer kirin ,mexînan bawer kirin

MAL

-(Canê xwe gûrî komkirina mal neke ,ji ber kû yê duwê hertim bi dest ,lê yê yekê ne)

Çînî

-(Çi car çav li malê dunya yê nebe)

Ferensî

-(Malê kû ji rêya diziyê bê dest,wê bê dizîn) Japonî

-(Mal, çengên wî hene , car tê cem te û car diçe himbêza yekê dî Erebi

-(Şanaziya zelumî bi rêzdariya wiye ne bi malê wî)

Yewnanî

-(Demê mal kete xanî ,eqil ji serê te derdikevit)

Elmanî

-(Mal,fermanrewayê kesê ehmeqe)

Ispanyolî

-(Têgehiştin û mal bi hev ra sazigar nînin ,demê yek zêde bû ,êdîtû yêdînabînî nabînî)

Yewnanî

-(Demê mal ji destê te çû, nas ji bo rêkirina wî diçin û êdî navegerin)

Elmanî

(Malê qelb ser xudanî da divegerit)

Gotinên Pêşîyan Di Çanda Gelan Da

- (Malê tirê, bi fisê diçit)
- (Mal jine û binyat xanî)
- (Mal qirêja destane)
- (Malî xo nexor ,bo çekme bor)

MÊHVANÎ

-(Kesê di mêhvaniyê da aciz bit ,bê adebe)

Îtalî

-(Eger te mêhvaniyek da ,divê heftiyekê rojîbî)

Skotlandî

-(Jibo mêhvaniyekê tû çiqas mezaxtinê jî bikî, dawî dîsa wê ji bîra mêhvanan biçit)

Inglîzî

-(Di mêhvaniya mirovê mûn û çavteng da hemû dixun û di dilê xwe da dijûnan didin mêhvandarê xwe)

Ferensî

-(Se û mêş û mirovê bêedeb ,ne vexwendî têne mêhvaniyê)

Inglîzî

-(Ehmeq mêhvaniyê didi û aqil xweşiyê jê dibet)

Yewnanî

-(Eger direng gehiştî mêhvaniyê,bi hîviya ranê berxî nebe)

Efrîqî

-(Mêhvanê rûqahîm bike kebab û bixwe)

Efrîqî

-(Di mêhvaniyê da eger ka ne ya te bit ,ma kadîn ji ne ya te ye?)

Farisî

Gotinên Pêşîyan Di Çanda Gelan Da

-(Xwarina baş dane ber mêhvanî)

Farisî

(Mêhvan hebîbê Xudêye)

(Mêhvanê direng hatî ,bêşîve)

(Ka ya te nebû ,ma kadî jî ne ya te bû?)

MÛ

-(Mûyekê ewqas biçûk jî sihê didet)

Inglîzî

-(Jiyan bi mûyekê ve girêdayi ye)

Farisî

-(Mamostayê kû mû bi serê wî vehebit ,ne memostaye)

Spanyolî

-(Yekemîn mûyê spî ,yekemîn bişkuja qonaxa pêriyê ye

Ferensî

-(Mû di derza wî ve naçit)

Farisî

-(Zalamê têrmû yan ehmeqe ,yan bextewerekê herî mezin)

Îtalî

-(Mûyê spî ne nîşana eqile)

Yewnanî

-(Wî pora xwe di aşî da spî nekiriye)

Farisî

(Hingî mûyekê ji berazî bikêşî ,xêre)

(Mû bûye werîs)

MAR

- (Zimanê xweş ,marî ji kunê derdêxit)
Farisî
- (Ne marê avî dikari karekê biket ,ne ji mirovê bêkêr)
Ferensî
- (Ta pê li dûvê marê nekî , bi dirêşînka xwe bi te ve nadit)
Inglîzî
- (Li ser her xezîneyekê marekê mezin razaye)
Erebî
- (Mirovê margestî ji werîsê reşûspî ditirsit)
Farisî
- (Dirêşînka marî û zimanê jinê her dû tirsna kin)
Îtalî
- (Marê reş dizanî ka despêkê kî bigezit)
Skatlendî
- (Eger tû marî dikujî ,têjika wê jî bikuje)
Ferensî
- (Eger tû marî di himbêza xwe da ji razînî ,çawa germ û asûde bû wê te bigezit)
Inglîzî
- (Mar ji pûngê acîze ,derê kuna wî şîn dibe)

Gotinên Pêşîyan Di Çanda Gelan Da

Farisî

(Maran gestî ji siha werîs ditiri)

(Mar heta rast nebit ,naçit kunê ve)

(Mar ji pûngê aciz bû ,derê kuna wî şînbû)

(Mar bû ,bû be ejdîha)

(Marê bi min ve nedet ,bila hezar sal bijît)

(Bizimanê xweş ,mar ji kunê tê der)

MAR

- (Divê marî bi destê dijminî bigirî)
- (Mar ta rast nebit ,naçit kunê ve)
- (Mar kesê razayî nagezit
- (Marê xweş xet û xale)
- (Mar di hûçkê xwe de xweyî kîrin)
- (Marê rengîn û zarokê nezan)
- (Têjikê marê jî her mare)
- (Demê mar pîr bû ,beq wê suwarê wî bit)
- (Maran gestî ji siha werîs ditirsi)
- (Margir dawiyê wê bi destê marî bê kuştin)
- (Navê xwediye pendên jêr nehatiye diyarkirin ,lê li gorî xuyaye dibi kû yên gelên Îranê bin (Wergêr)

NAN

-(Qenciya mirovê baş nanê wî ye)

Çînî

-(Tû nanî peyda bike ,penîrê wî wê bigehit)

Japonî

-(Êvarê eger tû qeteka nanî bînî malê ,baştire ji wê kû destê vala bêy)

Spanyolî

-(Kesê kû nivê nanê xwe da te ,ew dostê te ye)

Yewnanî

-(Gedeya kû bi piçek nan têr dibit ,çima ewqas jê ra perîşanî ?)

Erebî

-(Tû nan dixûy û zindiyî û ez nan didim û dijmîn)

Ferensî

-(Hêj tenûra germe,nanê xwe lêbide)

Ferensî

-(Nanê kû hatibit xwarin ,hatiye jibîr kirin jî)

Rûsî

-(Wî bi herdû aliyên nanê xwe nîvişk hesûye)

Ingîlîzî

Gotinên Pêşîyan Di Çanda Gelan Da

-(Li roja şer ,nane kû fermande û serbazên wî liser piya dihêlit)

Îtalî

-(Ta tenûr germe,dikarî nanî bipêjî)

Farisî

(Nanê xwe bixwe bi avê mineta cîranî bavê)

(Nan xwerê cilqetîn)

(Nan bo nanewa ,goşt bo qesab)

(Nanê bê ked ,herame)

NEFRET

- (Karîgeriya nefretê ji jehra bikuj zêderire)
Ferensî
- (Mirovê nefretbûyî hertim lêva gorê rûniştiye)
Ferensî
- (Nefret çekê mirovê reşbîne)
Yewnanî
- (Nefreta giran bêdenge)
Elmanî
- (Nefreta kû bê diyar kirin ,ji giraniya tolhildana wê kêmdiket)
Erebî
- (Nefret gezeba çekdare.
)Romî
- (Nefret despêka mirina dirêjxayane)
Swîdî
- (Eger tû ji hindekan nefretê diki ,xwesererast bike)
Erebî
- (Nesaxiya cuzamê direngtir ji nefreta mirovî dikujit)
Amerîkî

NE AMEDEVÎN (GEYBET)

-(Li her cihê, eger direng bighe, baştîre kû ne amade bî.)

Inglîzî

-(Dostekê baş eger ne amade jî bit, herwekû amade tê jimartin.)

Ferensî

-(Kesek bê sedem neamade nabit.)

Elmanî

-(Di nebûna dijmin da jî ne axive .)

Yewnanî

-(Avxwê û geybet, hezkirin û evîndariyê jinav dibet.)

Inglîzî

-(Eger te geybet kir, bila hîviyeka te tunebi .)

Turkî

-(Carek ne amade bûn, temenek poşmanî .)

Hindî

-(Neamade bûn heman û paşkeftin heman .)

Amerîkî

PERE

-(Demê te pere hebin, derdor wê ser û rûyê te maçbikin.)

Îtalî

-(Pere xulamê aqil û axayê zelumê ehmeqe .)

Elmanî

-(Eger pere di berîka te da hebin, lê serê te ne lî ser stuwê te bit, xem naket .)

Inglandî

-(Parey lî wî cihê te wunda kirî, peyda bike .)

Spanyolî

-(Bê pare, bê kes.)

Îtalî

-(Hezkin ji parey û hezkin ji zanistê, nîkarîn bi hevra rêve biçin.)

-(Demê pare kete berîka te ,eqil ji serê te difirît)Inglîzî

-(Pere îmana gelean bi ba didet)

Ferensî

-(Yê kû îmana xwe bi parey bifiroşît ,ne insane)

Hindî

-(Ji berîka dost mezaxtin ,sanahiye)

Rûsî

(Pere qirêja destane .)

(Parey spî bo rojî reş.)

Gotinên Pêşîyan Di Çanda Gelan Da

(Pere perey tînit .)

(Perey bide, melay ji mizgeftê derbêxe .)

(Ke paret bû, kes napirsî kurî kêyt.)

PER

-(Hêlîna mirîşkê per bi per tê sazkirin)

Swîdî

-(Mirîşka kû xwedî perên giran bihaye, temenê wê kurte.)

Efrîqî

-(Hêlîna kû perên zêde lê hebin, direng xirabdibit.)

Inglîzî

-(Perî nîşan bide ,ta ji te ra bêjim mirîşka wê çiqas tînit

Hindî

-(Mêrikî per bi kumê min ve kir)

Îtalî

-(Hertim giraniya perê dawiyê ye kû kemera hespî di demê barkirinê da dişkînît)

Inglîzî

-(Ji perê kumê wî netirse , deyn girtiye)

Ferensî

-(Bi hejandina perekê jî dibû kû min li erdê bidî)

Ferensî

-(Jin û perwe kû hevin ,ji her aliyekê ve ba bêt ,bi heman alî ve diçin)

Amerîkî

PÊ

-(Kesê kû numreya piyê xwe jî nezanit , karê wî temame)

Inglîzî

-(Piyê mezin ,ne nîşana gavavêtina bilinde)

Elmanî

-(Kesê piyê wî şil bû ,êdî kurahiya avê jê re nexeme)

Inglîzî

-(Bi piyekê di pêlavê da û piyekê pêxwes kû nabe rêveçûn)

Efrîqî

-(Mane pê karê dest naket)

Elmanî

-(Eger bi piyê çepê ji textî bêye xwarê ,ta êvarê wê mirûtê te tîrş bit)

Ferensî

-(Piyê xwe neke pêlava kesên di da)

Farisî

-(Bi pêsxwasî kû naçin xizmeta walî)

Inglîzî

(Mih pê xwe ,bizin pê xwe ,her kes û emelê xwe)

(Piyê xwe hindî berika xwe dirêj bike)

(Piyê xwe neke pêlava minda)

QAZÎ

-(Qazî hertim ji yasayê dibêjit , lê yasa qaziyekê bê axaftine)

Yewnanî

-(Hiç kesek nikarî jibo kiryarên xwe qaziyekê dadmend bit)

Inglîzî

-(Qaziyê kû bê gunehê tawanbar biket, wîdana xwe tawanbar kiriye)

Swîdî

-(Qaziyê bertilxwer ,berî mirinê wê dîn bibit)

Japonî

-(Wextê gunehbar bibit qazî ,divê fatîheya yasa yê bê xwedin)

Çînî

-(Ji heneka qazî ,bes ew bixwe û defterdarê wî dikenin)

-(Eger kesek jibîlî xwe qaziyek ji boy xwe nebit ,wê xirabibit)

Inglîzî

RÛVÎ

-(Rûvî çî carê li nizîkê kuna xwe nêçîrê naket)

Inglîzî

-(Rûvî xweş dibezit ,lê li şûna wî çuçîka mirîşkê jî çeng hene)

Holendî

-(Rûvî jî eger bû hakim ,divê jê ra kîrnûşê bikî)

Rûsî

-(Qaz divê zor ehmeq bit kû ji dûr ve rûvî nas neket)
Skatlendî

-(Rûvî kavirî dikujit ,lê li pey mihê dikevit)

Ferensî

-(Rûvî nabit di wextê dadkirina mirîşkê da ,qaziyê dadgehê bit)

Çînî

-(Axir rûvî li debaxxanê kevil dîkin)

Turkî

-(Rûviyê têrxew ,mirîşk û çuçîkan di xew da dibînit)
Ferensî

-(Bi kesên rûvî rewuşt ra ,rûvî rewuştane dan û syandinê bike)

Erebî

-(Bêhna rûvî têt = Rewş bi talûkeye)

Elmanî

-(Gotine rûvî ka şahidê te? Got dûvêmin)

Gotinên Pêşîyan Di Çanda Gelan Da

Farisî

(Rûvî ne diçû kunê ve, hejîk bi kuriya xwe ve dîkir)

(Gotine rûvî ka şahidê te ? Got :dûvê min)

(Rûviyê geray , çêtire ji şêrê razay)

(Ta bê gunehiya rûbvî derket,kevilê wî birin debaxanê)

SER

- (Serê mirovê aqil ,çi car naêşit)
Îtalî
- (Serêş ,zîla talûkeya nesaxiyê ye)
Ferensî
- (Serê mirovê pîr ,li ser stuwê mirovê genc ranaweste)
Yewnanî
- (Çi car dû ser naçin bin kumekê ve)
Îtalî
- (Serê kû neêşit ,desmalê lêgirênede)
Farisî
- (Serê werimî ,baştire ji mejiyê çirmisî)
Çînî
- (Ew mina mirîşka kû avê vedixwe,hertim,serbi hewaye)
Skatlendî
- (Serê min bişkîne,lê rastiye bêje)
Rûsî
- (Serê wî bêhna qurmesebziyê dide)
Farisî
- (Serê min bişkîne ,lêbihayê min neşkîne)
Farisî
- (Kesê serê wî ji şîşeyêbit nabit keviran bavêjit)
Inglîzî
-) (Serê xwe bide,soza xwe neşkîne)
(Serê dû beranan di dîzikekê da nakelit)

Gotinên Pêşîyan Di Çanda Gelan Da

(Ziman bi westê,ser zor rahete)

(Sereke û hezar sewda)

(Serê mezin,ne nîşana aqile)

(Serê ser jê neêşin ,bila bibê gû liber bikêşin)

(Serê neêşit ,hewcey desmalê naket)

SE

-(Wextê se bû xweyê xanî ,zû ji wî xanî here)

Inglîzî

-(Seyê kû pezê kerî gezkir ,cihda bikuje)

Ferensî

-(Se li berderiyê mala xweyê xwe parsê dike)

Elmanî

-(Se li mala xweyê xwe şêre)

Amerîkî

-(Seyê resen ,hertim xewna nîçîrê dibînit)

Elmanî

-(Seyekê hestî xweriye =gelek bi serhatiye)

Rûsî

-(Seyê wî ketiye çalê da = şansê wî tune)

Mecaristanî

-(Eger hestî nedî seyê deh salî jî,wê te gez biket) Îtalî

(*) (Seyê ziyanî ,wê bi ziyanê biçit)

(Segî har ,temenî çil roje)

(Neçe meydana gurgê ,eger seyek ligel te nebit)

SOZ

-(Belge diqetit ,lê soz naqetit)

Elmanî

-(Di navbera mirov û şerafetê da tayek zirav heye û ew jî soze)

Farisî

-(Soz, siha kiryarê ye)

Çînî

-(Soz wekû tîrê ye ,çawa kû hatavêtin ,êdî li kevanê navegerit)

Erebî

-(Heywan bi lingê xwe tê girêdan û mêr bi soza xwe)

Japonî

-(Mêrê kiryarê be ne mêrê gotinê)

Çînî

-(Axaftina şîrîn û kiryara tehl ,gelek kes xapandine)

Frensî

(Soza mêrê baş ,soze)

(Dewar bi kapê xwe û mêr bi soza xwe ve tê girêdan)

(Serê xwe bide ,soza xwe neşkîne)

ŞIYAN

-(Piçekê kêrhatin,gewherê şiyane ye di serkeftinê da)

Elmanî

-(Zanîn,şiyane)

Farisî

-(Kesê kû şiyana wî hebit,li her derê dikari xwe cihbiket)

Farisî

-(Xwestin ,şiyane)

Farisî

-(Ji her kesê li gorî şiyana xwe bo her kesê lî gorî
pêwîstiya xwe)

Inglîzî

-(Şiyan dibînit û derfet wê direvînit)

Elmanî

-(Mirov bi hemû hêza xwe ve şiyana guhertina biçûktirîn
rêrewa xwezayê nîne)

Yewnanî

-(Eger tû şiyana pêkanîna kerkê di xwe da dibînî ,here
pey,weger ne tû çima abirûyê xwe dibî)

Yewnanî

ŞER

-(Di şer da, Xudê hertim piştevanê leşkerê bihêztire)

Inglîzî

Hêkdi aştiyê da, baştire ji mirîşkê bi xwe di şer de)

Elmanî

-(Şer babê aştiyê ye û zêr dayîka wê)

Çînî

-(Manê di şer da helewê parve nakin !)

Farisî

-(Demê şer bû qazî,encama raya dadgehê bextreşiye) Îtalî

-(Serkeftinên mezin ,gişt li gorî hilkeftinan bidest tên)

Ferensî

-(Her şûr hilgirek nabi fermande)

Erebî

-(Arezûya şer dike ,lê ji nêyzebaziye ditirsit)

Erebî

(Şerê sibê ,baştire ji sulha êvarê)

ŞANS

-(Kesê kû bi hîviya şans ve bijît ,ji sala berê ve ew miriye)
Ferensî

-(Li pey şewqa kû li esmanê şans tê lêdan,ewrên reş jî hîvî bike)

Macarisltanî

-(Devê şûrê şans ,ne bireke)

Hebeşî

-(Li hîviya şans rûniştin heman û di pêxewa mirinê da razan jî heman)

Elmanî

-(Kesê kû şansî bikete rênîşanderê xwe kûre)

Îtalî

-(Eger şans min bikete rêber , nediya kû min di cih da tune jî biket)

Merakişî

TIRS

(Kesê kû di bûna te da bitirsit, di nebûna te da ji te nefretê dike)

Îtalî

(Tirs birayê mirinê ye)

Farisî

(Cihê kû têgehiştin lê fermanrewaye ,tirs nagehitê)

Inglîzî

(Hiç tiştek wekû tirsê bi xwe,bi tirs nîne)

Amerîkî

-(Tirs te ,dibi sedeme dilêriya dijmin)

Îtalî

-(Eger te xwe li ber teyrokê girt ,tû wê bikarî xwe li ber tûfanê jî bigirî)

Çîkoslovakî

-(Dawiyek tirsnak,baştire ji tirsek bê dawî)

Elmanî

-(Tirs ji bûyerên nebûyî ,ehmeqiye)

Yewnanî

(Tirsinok rojê hezar car demirê)

-(Kese kû ji zehmeta jiyanê bitirsit ,ji tirsê di zehmetê da ye)

Çînî

WIJDAN

-(Wîjdan tenya dadgehe kû tê da pêdivî bi dadwer naket)

İnglîzî

-(Wîjdan nuwênerê xudêye di zemîrê mirov da)

Erebî

-(Wîjdana ne asûde eşkenceya rûhe)

Îranî

-(Dojeha rastîn, wîjdana bi êşe)

Eknebî

-(Eger wîjdan bîrîndar bû, êdî baş nabit)

Çînî

-(Kesê kû wîjdanawî tune ye hîç tiştekê wî tune ye)

Amerîkî

-(Zêlamê qenc, dengê wîjdanê dibihîsit)

Spanyolî

-(Azadiya wîjdanê, nîşana xudêperestiyê ye)

Îtalî

-(Kesê kû wîjdana wî paqij bit ,hertim dilşade)

Çînî

-(Wîjdana kesê “ceban” nepaqije)

Îtalî

XWÎN

-(Peymana kû bi xwînê bê girêdan,bes bi xwînê jî tê şkandin)

Latînî

-(Hertim wextê dilopek xwîn diriji ser erdê,dilopên dîtir jî berbi xwe ve dikêşi)

Yewnanî

-(Xwîna neheq narazê)

Farisî

-(Xwîna hemû mirovan yeke ,lê hêjatiya wan ...?)

Elmanî

-(Rondik û xuhdan û xwîn çi car bê encam namînin)

Inglîzî

-(Hertim dawiya her nakokiyekê xwînê zelal kiriye)

Elmanî

(Xwîna sor,baştire ji jîna serşor)

(Xwîna çi carê nabit av)

XWEKUJÎ

- (Xwekujî ,belgeyekê eşkereyê gunehbariyê ye)
Skotlandî
- (Xwekujî kurtirîn navbere di navbeyna jinan û dojehê da)
Înglîzî
- (Xwekujî pileya herî bilind ya ahmeqiyê ye)
Elmanî
- (Tirsnak xwekujiyê diki û wêrek dijî)
Elmanî
- (Kesê kû hêza berxwedana jiyane tune, bi neçarî şerîte davêji stuyê xwe)
Çînî
- (Hêviya mirinê xwestin hewareke kû ji gewriya kesên ketî derdikevit)
Elmanî
- (Eegr jiyana serbilind çenebûye, ma mirina serbilind jî çênabi !)
Spartî
- (Îro kû te xwe kuşt, sibê wê her kes te ji bîr biki)
Yewnanî
- (Xwekujî “Îqrar” kirina bi gunehê ye)
Frensî

Gotinên Pêşîyan Di Çanda Gelan Da

-(Her kes dikari xwe bikujit, lê her kes ne hêjaye bi
serbilindî bijît)
Yewnanî

XWAZOK

“Ehmeqiya kesan, wêrekiya xwazokî zêdetir dikit”

Înglîzî

“Xwazok herçiqas stuyê xwe xwehrtir bikit, zêdetir dîrwan dikit”

Skotlendî

“Xwezok na xwazi xwezokê din bibînit”

Spainyolî

“Xwezokek ji bo bê abirokirina miltekê bese”

Yewnanî

“Berîka xwazokî tu car tejî nabi”

Îtalî

“Ger tû pereyek reş bidî xwazokekê wê spihek bikevit laşê te” (Dilpêvemana ne di cîh de belayê tînit)

Înglîzî

“Kesê xwazok hertim xwazoke”

Macarî

“Biminre, lê xwezok nebe”

Frensî

“Ma xwazok kengê şermê dizanît!”

Înglîzî

“Mirovên xwazok û ev qasî daxwaz!”

Frensî

XWAZOK

“Ger te rû da xwazokê, wê bibit xwediyê malê”

“Ger şerma xwazokî tune, xêra wî jî tune”

“Xwazok ji ber tamahiya xwe dixwazi kurê wî kur bit”

“Ger Dinya hemû bidete xwezokî, her xwezoke”

“Xwazok bi xwezokê, sed rehmet li Xwedê”

“Ger tû rû bidî xwazokî wê bibi xweyî”

“Gotine xwazokê tû bi xêr hatî, tûrbe vekir û pêş hat”

“Xwazok nikarî xwazokî bibînit”

“Xwazokî karekê peste”

**Xwediyê van pendan nediyarin, lê çedibit kû girêdayî
çanda gelên Îranî bin.(Wergêr)**

XWÊ

“Peymana kû bi nan û xwê hate girêdan, nayê şkandin”

Frensî

“Tû dikarî zelumî ji xwêya li ser sufreyê wî binasî”

Înglîzî

“Xwê nerêje ser birîna dijmin”

Hindî

“Ger te xwê xwar, xwêdanê neşkîne”

Farisî

“Gotina bê xwê, ne ji şimşîrekê kuh baştire”

Erebî

“Her tiştê kû genî bibit, xwê lêdidin, wey bi wê rojê kû
xwê bi xwe genî bibit!”

Farisî

“ Xwêya her girarekêye”

“Xwê li birîna kesekê neke”

“Me kîlûyek xwê bi hev ra xwariye”

“her tişt bi xwê, xwê jî bi qayde”

“Bê nan û xwêye= bê nan û nemeke”

YASA

“Yasa ya kû bi derbaz bûna demê re nayê guhertin, bikêr nayê”

Yewnanî

“Kesê kû arîkarî ji yasayê digri, dikarit gurgî ji guhê wî ve hilawisi”

Amerîkî

“Demê diz bû hevalê qazi, fatiheyê yasayê tê xwendin”

Îtalî

“Di batmaneka yasayê da, misqalek nermahî peyda nabit”

Frensî

“Bes mirovên diz û şerok rexne li yasayê digirin”

“Demê yasa zêde bûn, resenî û dadmendî tûne dibi”

Frensî

“Yasa çalek bê bine, kesê tê ket êdî karê wî temame.”

Çînî

“Yasa ya kû derbarê şêr û gayê yek cor biryarê bidit ne yasayê”.

Inglîzî

“Yasa exsîrê edetêye”

Yewnanî

ZIVISTAN

“Zivistan paşnihandina havînê jibeyn dibet.”

Îngilîzî

“Zivistan kû sarbû, goristan bi rewneq dibit.”

Îtalî

“Zivistane kû hîvya biharê li pey ye nepayîz”

.Fransî

“Zivistan neviyê havînêye”

“Wextê belgên daran weriyan, bizane zivistan li pêşe.”

Yewnanî

“Li havînê kû tû dikenî, hizra bêmirotiya zivistanê bike.”

Çînî

“Di zivistanê de, kîkometrek rê dibi dû kîlometre.”

Erebî

“Zivistan salê carekê tê.”

Yewnanî

“Zivistana kû gelek sar bû li hîviya havîna germ bibe”.

Îngilîzî

Gotine feqîrî vaye zivistan hat, got ez hazirim ji bo velertzînê.

“Mirov carekê dibêji zivistan sare.”

ZEWAC

“Mehra jinek baş, gêzikek baş”

Çînî

“Dewama her jianeka jin û mêrîniyê beşekê wê li ser hizirînê ye û neh beşên dî li hev bûryîna- kêmasiyane.”

Îngilîzî

“Zewac zûyê wê şaşitiyek mezine û direngê wê jî şaşitiyek mezintir.”

Fransî

“Hîç kesekê neçarî dû karan neke: şer kirin û jin anîn.”

Erebî

“Her çiqasî jî gustila jinê bê mehandin, bi heman qasê heskirina wê ji mêrê wê ra kêmtir dibi”

Amerîkî

“Mêrê bê jin her dem kirasê wî qetiyaye û mêrê xwedî jin jî ji xwe kirasê wî tune.”

Îranî

“Di hîlbijartina jinê de her dem pileyekê ji xwe nizimtir berçav bigre û di hîlbijatina dostan de pileyekî jortir bigre.”

Çînî

PENDÊN HEMRENG

“Seyê kû parçe hestî di devê wî da ye her dem di tehlîkê da ye.”

Efrîqî

“Dilopek hingivîn zêdetir ji sênîkek sirke mêşan li dora xwe kom dike.”

.Îngîlîzî

“Tiştên kû ziman dibêji ne pêdiviyê kû dil jî bêtî.”

Fransî

“Yê diz tevayî xelkê bi diz dizani.”

Îspanyolî

“Bêdengî xemla nezaninê ye.”

Sanskirî

“Rastî û gula sor her dû bi stirîne.”

Îspanyolî

“Agirkirin û çirûsk lê dan, ne karê her zanayekê ye.”

Siwêdî

“Yên bextewar temaşeyî demjimêrê nakin.”

Rûsî

“Zêr meqnetîza mirove.”

Lehîstanî

“Kesê kû zêdetir dizani, tirsê wî zêdetire.”

Gotinên Pêşyan Di Çanda Gelan Da

Îngilîzî

“Dû sed gotin nabin nîv kiryar.”

Îranî

“Jî kesên nûmal, deynan nexwaze”

Îranî

“Di rêya zanistê de, hertim ji bo ferbûna zanistê hewl bide û dilniya be kû ji boy fêrbûne çî wext direng nîne.”

Îngilîzî

“Kesê kû xêrê bidi, divê bêdeng bi û kesê kû xêr digihitê, divê derbarê wî da baxivî.”

Îspanyolî

“Qenciye kirin û daxwaza heqdest yan beramberî kirin, tê wateya tune kirin û bê bihakirina wê qenciye.”

Çînî

“Xwazokekê dibînî û cilekê diki ber wî. Eger bi cil kirina wî bidi rûyê wî tê wateya rûskirina wî. xêra kû tû îro bi wî bikî bextewariya te ya sibê pêktîni.”

Hîndî

“Tû xwedî insiyatîfa wan gotinanî kû hêj ji devê te dernektine. û tewamberê wan gotinanî kû ji devê te derketine.”

Erebî

“Her çiqasî çiqê darê serê xwe nizimtir biki, heman qasê fêkiyê wê zêdetire.”

Îranî

“Kesê kê bi niyaza xweşî û lezetê ve bikevi xaniyê bextewariyê, wê bi behitînê jê derkevit”.

Rojhilatî

“Fêkiyên nezanînê şermezarî û encama gezebê poşmaniye.”

Rojhilatî

“Tenha şîreta kû xelk pêktînin û pere pêdidin axaftina dixtor yan parêzvanê dadgehê ye.”

Îrlandî.

Gotinên Pêşyan Di Çanda Gelan Da

“Mala dostan vala bike ,lê deriyê neyaran nequte”
“Peyman nebestin,baştire ji wê kû tû girêbidî û pêkneyînî”
“Wextê dû dil bibine yek ,wê çiyay hilweşînin”
Dû sed gotin nabit nîv kiryar”
Çêlekek têr şîre ,lê pehinan dide”
Zanayê xwe parêz,kûrekê çira bideste”
“Ta sedî sed nezanî gotinek raste,nebêje”
“Dunya nehêjayê hindê ye kû tû dilekê bêşînî”
“Ka wê spêde çi bizêt ji vê şeva avis”

**Pendên di vi rûperî da gorî xuyaye taybetê çanda
gelên Îranêne(wergêr)**

“Eyne girtin di civaka kûran da wekû nargil bi destgirtina
bûzînê ye”

“Baş tedbîr kirin piçekê ji malê mirov zêde dike û xirab
tedbîr kirin,zêdehiya malî ji tune dike”

“Bêkêrtirîn xelk ew kese kû nikarî xwe sererast bikert”

“Zana zindiye herçend kû mirî bit û nezan miriye herçend
kû zindî bit”

“Dilnizmî mirovî bilind dike û xwe mezin kirin wî biçûk
dike”

“Dûreperêzî û teqwa, dîwarên qahîmin”

“Her zoriyeka rojigarê, berekê qahîme ta merd û namerdan
ji hevdû cuda biket”

“Wê ji te bipirsin hunerê te çiye, nabêjin babê te kiye”

“Li min seryr tê kesê kû mirina kesekê dibîne ‘û mirinê ji
bir diket”

“Îbadet ne tişteke ji bilî xizmeta mirvan”

WATEYE HINDEK PENDÊN FARISÎ JI ELAME DÊHXUDA

-“ Tatayê temet”=(Ta dawîya pirtûkê)

“Ji difîna filî ketiye”= (xwe gelek mezin û piş dibînit)

“Ji difîna şêrî ketiye”=(heman wateya jor)

“Ba di hûçkê kesekê kirin”= (pişkirin û bilindkirina kesekê bi axaftin yan her awayî ne li gor rastiya wî)

“Zebeş bin kefşê kesekê danîn” = (Pehniyên kesekê kêşan = bi heman wateya gotina jor yanî mezin kirina kesekê bêy bingeh)

“Hilû biya bigelû = xoxê were gewriyê”

=bêy ked û renckêşanê ,kes nagihit mexsedê)

“Tejîbûna piyanê”= (bi dawî hatina sebir û hedara kesekê)

“Havîn babê hêtîmane” = (yên hejar û nedar li havînê pêdiviyê cil û mala germ nînin)

“Ba li birîna wî ketîn” = (nû bi xwe hesiyan tevayê mal û mîratê xwe di demekê kurt da bi bad daye û nû bi xwe hesiyaye)

“Yê bayê anî, wê ba bibet jî”(1) = (her tiştê bi sanahî û tena bête dest, wê bi sanahî jî ji dest biçit)

“Bi gurê ra dûngî dixwe û bi şivan ra digirî ”

Şirîki û hevkarî kîrîn bi diz ra)

“ Bixwe û vexwe karê mine

Xudê parêzvanê mine” =(Jibo kesên tembel û xemsar tê gotin)

ELLAMEDÊHXUDA yeke ji nivîskarên navdar û pisporê zimanê Farisî kû xwedî ferhengnameyek hêjaye.(wergêr)

(1)(Kurdi dibêjin: “Malê tirê bi fisê diçet”(wergêr)

(2) (Kurd bibejîn “Bi guran ra goşt dixwe ,bi xweyîra şînê dike)(wergêr)

“Dendik di devê kesekê da şkandin”=(bi soz û wade dayînê, di kesekê da temahî çêkirin)

“Hêka dû zerik dide”=gelek ezîz û delale

“Piyê wî li ser tûvilê gindûrê ye”=rewş û meqamê wî neqahîm û seqamgîre

“Dawîya bêkariyê, perîşaniye”= bêketdû kar çênabit rûnî

“Kurtanê wî xwehre”= ne paqijî, yan ji ne kesekê bawermend û qence.

“Kevilê hêştirê barê kerê ye”=li ser hemû bêkêrî û lawaziyê ra jî, ji te yê bideselat

kêrhatî tire .

“ Kevilê hirça nekuştî difiroştî = xezala ne girti di kete diyarî.

“Çûna telîsî da”= Tengavbûn .

“Bê reye” = bê xîrete = nexweşmêre.

“Ji sed zimanan ,zimanê bêdengiyê spehîtire”=bêdengî nîşana rezamendiyê ye .

“Ji kîskê xelîfey mezaxtin”=Ji malê ditirann,xelat û bexşîş dayîn.

“Av nalivit”= nişana hebûna asayîş û tenahiyê .

“Avê ji deryayê dibexşit”= hertim ji malê xelkê qenciyan diket .

Gotinên Pêşyan Di Çanda Gelan Da

“Destê wî dilop nake”= zor mûn û çavtenge

“Av bi xerbakê pîvan”= karê vala û bêhûde kirin

“Ronahiya tavê bi heriyê suwax kirin”= veşartina rastiyeke misoger bi hindek belge û nîşanên lawaz .

“Tîştê di qazanê da, wê ser kefçê bikevit .

“Qasê kû li ser erdê ye, dû qasê wê li bin erdêye”

“Kesekê fêlbaz û teşqele çîye .

“Ah di buxçeya wî da tune”= gelk hejar û desttenge .

“Bi dûvê xwe gwîz şandin”= keyfxweş bûneka zêde ji pêşhatekê .

“Hêj tenûr germe, dibe nan bêpehtin”= hêj amêr û derfet heyî, hewldana xwe bike.

“Bezekê zêde li pehniyê didin”= jiber dewlemendiya zêde, dest beredayî ye.

“Pere ne pêxwera hirçê ye”= çênabit bi her xwazyarekê zêr û ziv bidî .

“Pere dêwe û em ji Bismillah û = tû car pere li derdorê me peyda nabit .

“Ew pere heye kû dengê dikilî ne bihîstiye”= gelek zêr û zîv û malê wî heye kû di bin axê da veşartîye.

“Di heft esmanan da stêhreka wî nîne”= gelek desttenge .

“Derî hertim li ser pehniyekê nagerit”=ji her nişîvekê ra evrazek û ji her evarazekê ra nişîvek heye .

“Birîna wî germe”= hêj bi wê belaya serê wî hati nehesiya ye.

“Zivistan çû û rû reşiya wê ji rejûyê ra ma”= herçend arîkarî û qenciyeke nekir jî ,karê hati reşaw kirin pêkhat.

“Zivir û bilind gotin”= dijûnên hişk û kirêt gotin = pûç û napesend axaftin .

“Binpê kesekê tûvilê gindûrê danîn”=bi xapandinê, ew tûşî netirsiyekê kirin.

“Simbêl duhn dan”= bertîl dan .

“Serekê ji hev cudane”= gelek bi hev ra dost û mêhrebânîn.

“Kevir û sebû”=dû tiştîştên dijber û li gelhev kom ne bûyî .

“Dêwê bêşax û kurî”= zelamekêbi heykel mezin û gewere.

“Qedra çîmenê bilbilê perîşan dizanît”= xema mirina biray, biramirî dizanît .

“Ezmanê kerê xelk dizanît.= ev herdû kes reftar û xûyê hevdû baş dinasin.

“Rojiya bê nivêj”= “Bûka bê cihaz”= Qurmeya bê pîvaz”= karekê nîvçe û netemam.

“Rojên biharan,fîravîn heft caran”= di werzê biharê da, meyl û îştihayê xwarinê zêde dibit.

“Rûviya mezin, rûviya biçûk xwar”=ji birsan gelek bêhedar bûye .

“Girêdana kesê felîte û şîret kirina salve çûyî bê sûde”= kesê reftar û xûye neqenc girt ,êdî nikarît dest jê bikêşit.

“Cilê dû cariyeyan di testekêda nayên şuştin”= jinên dû birayan hertim hevrik û pêşberê hevin.

“Devê berika wî tevnepirekê girtiye”= ev demeke kû pere di berîka wî da tunene.

“Deh û pênc bi kesekê ra kirin”= bi kesekê ra xirûcir û mîlmlanê kirin.

“Devê wî aster kiriye”=gelek sanahî xwarinên germ dixwe

.

“Devê seyê hertim vekiriye”jibo kesekê kû hemîşe dijûnan dibêjit û geybetê dike.

“Dostîniya yadê hîrçê”= jêhezkirineka bi nezanînî kû zîyan û tengaviyê bi xwe ra tînit.

“Wê dûyê wî biçit çavê te bi xwe”= tû bi xwe wê keyferata karê xwe yê neqenc bibînî .

“Av dunya yê bibet ,ew di xew da ye”ta dawiyê bêxem û bêserinc bûn di kar û jiyan û bi derdorê xwe ra.

“Dunya bi malê wê ve hêjaye”= jiyana bi niyazmandî û hejariyê filisekê nahêjit.

Gotinên Pêşyan Di Çanda Gelan Da

“Hûn bi qenciya xwe lê binêrin”= eger wî kêmasiyek kiriye ,hûn bi mezinahiya xwe li wi bibûrin.”

“Eger dû mîşk şer bikin, wê serê yekî li diwarî bikevit”= yanî xanî gelek teng û biçûke.

“Bi kerîni za bi kerînî jiya û bi kerînî mir “

“Di seranserê temenê xwe da her gewc û nezan bû.

“Hemamçî di gehit hemamçî,sindûqê maçîdiket”= dû kesên hevkar divê rêz û hermeta hevdû biparêzin .

“Destê kesekê di nav henayê da kirin”= neçar kirina kesekê bi berdewamiya karekê ji bertirsaji ziyan yan ji metirsiya wê

“Desrtê geybê”= hewar û arikariya ji aliyê xudayê mezinve.

“ Demê dest zêde bûn, bereket kême”= zêde bûna hevkarên di pîşe û karekêda, dibit sedemê kêmsûdî û bê rewneqiya bazarê wan.

“Dest û rûyê xwe bi ava mirîşûxanê şuştîye”= gelek bê şerm û heyaye.

“Dil ne sufreye kû mirov li ber her kesekê veket”.

“Mirov nikarî kul û derdê xwe ji her kese ra bêjî .

“Dûvê wî li ser milê wî danîn”= bê hîvî û dilşkestî rêkirin .

“Didan qîçkirin”= temahî yan ji hîvî birîn .

“Didan tîj kirin”= temahiya tiştê kirin

“Didan girûvel bûn”= bihayek giran li ser tiştê xwe danîn.

“Didanê kû dêşit, divê bê kêşan (*)” = jin yan dost yan ji xizmetkarê nebaş divêmirov jê dûr bikevit .

“Dû kesên tazî li hemamê xweşin”= jibo henek ji jin û mêrekê hejar ra tê gotin kû bi evina hevdû keyfxweş bûne û ji tevayê pêdiviyên yanê çavê xwe niqandine.

“Dest ji pê dirêjtir hatin”= dilşkestî û destê vala ji encama karekê vegeriyan.

Kurd dibêjin “Didan êşan, derman kêşan .

“Dû mar ji kunekê dernakevin kû yek Turkî bistirê û yê di Farisi”= yanî zarokên dê û babekê yeksanin û yek ji yê di baştir nîne .

“ Her dû cuwalên barekêne”= bi her dû awayan jî, encam her yeke.

“Dû sed men (1) hesti divê kû sed men barî raket”= wekû bêji (Rexş(2) divê kû laşê Rostem bikêşit”

“Bihayê xwîna babê xwe dibêjit”= bihayekê pir giran dibêjit .

“Qelem di xizmeta dijmin daye” = tiştê kû dibêjit yan diket li ser bingehê dijminiyê ye .

(1) yek men sê kiloye .

(2) Rexş hespê Rostemê Zale

“Qulf sinûrê navbera heramzade û helalzade ye” = îmane kû pêşiya diziye digirit, weger ne şkandina qulfê sanahiye .

“Ez baweriyê bi qismetê bikim yan bi dûvê dikilî”= belge û tiştê berçav û heyî, berevajiyê gotina te ye .

“Kirêgirtiyê cihekê bûyîn”= her ji despêka kar ji hertiştê agehdar bûn.

“Çarçîwe şidandin”= ketina kar di nava rewşek teng û zirav da .

“Mohrika qumarxanê ye”= zelumê kû hemû karên kirêt û na pesend dinasit ,yanî her karek ji destê wî tê .

“Fîl û fivcan”= dû tiştên ji hev dûr û cuda di biçûk û meziniyê da .

“Zarokê bê edeb,wekû tiliya şeşêye , tû bibirî dest dêşit, nabirî kirête.

“Sibê jî roja xudêye”= ne hewce ye kû hemû karan îro pêk bînî .

“Eqilê wî kevîran hûrdike”= berevaji, ew dîne .

Gotinên Pêşyan Di Çanda Gelan Da

“Bêhnijîna kes yan tişteke bûyin”= tam mîna wî bûn.

“Şîrê mirîşkê”= tişteke peyda nebûyî”

“Şîrê mirîşkê û canê mirov”= jibo tişteke kû bidest anîna wê ne gengaze.

“Dijminî, dijminiyê tîni”

“Ji vê stûnê bi wê stûnê fireheyêke”= di çavniqandinekê da guhertina rewşê û rizgar bûn ji metirsiyê .

“Ji kerê şeytanî piyade bibe”= dest ji serhişkî û yekdende bûnê berde .

“Kirênişîn, xweşnişîne”= kirênişîn xwe li ber xirabiya xanî yan reftarê xirabê cîranî nagirit û zû ji xanyekê diçit xaniyekê dî .

“Mûyek ji hirçê kêşan midîtiye”= ji kesê mûn û çavteng tû çi bidest bîni her başe .

“Didanê hespê xelatbûyi nahejmêrin”= Çênabit li ser tiştê bi xelat hatî kêmasî û hêcetan bigirî .

“Bi pembû serjêkirin”= bi zimanekê xweş û nerm tune kirina kesekê .

“Demê bext zivirî, palûde jî didanan dişkînit = mirovê bextreş, eger karekê qenc ji biket.

wê her bi ziyana wî temam bibit .

“Bi xiyalê wî Elîabad jî bajêreke”= jibo kesekê tê gotin kû bi şaşîti û nezanîn ve temahiya kar yan tişteke diket.

Kurd dibêjin hindî mûyek ji berazî bikêşî xêre .

“Bi duayê kêtika reş baran nadarî”= ah û nefrîna mirovê bedkar û neqenc bê bandore .

“Bêhna Erehmanê tê”= ji bo kesekê kû nîşana pîr bûn û ji kar ketinê di wî da xuya bûye

“Nal kirina pêşiyê di hewada”= gelek fêrz û kêrhatî û fêlbaze.

“Qencî ber bi mala xwe ve divegerit”= encama xêr û qenciya her kesê ber bi wî ve divegerit .

Gotinên Pêşyan Di Çanda Gelan Da

“Sicada nivêjê dişût”= bi niyaza xapandinê xwe bawermend û baş xistina berçav .

“ Şerê zêringirî”= li hev xistina direwn jibo xapandina hindekan.

“Yasîn xwendin di guhê kerê da”.= şîret kirina kesê nezan û ehmeq.

“Hem Xudê dixwazit, hem xurmê” = jibo kesekê kû dû tiştên dijî hev dixwazit û nikarit ji yekê dest bikêşit.

“Nan nîne bixût, pîvazê dixût ta îştîhayê wî vebit= ji kesekê ra tê gotin kû pir destteng û nedare, lêzirtên xwe dike û bilind difirint.

“Nan bi bihayê rojê xwarin” =divê bi rewşê re bisazî” = divê li gorî pêdivi ya demê xwe amade bikî

“Mirîşka kû hejîran dixut, nikilê wê xwehre”= jibo kesê kû xwe li ber karekî re dike kû nikari pêkbînit.

“Margestî, ji werîsê reş û spî ditirsit”= Yê kû ji tişteke eşiyaye , ji hertiştê wekû wî ditirsit.

“Mar ji pûngê acize, derê kuna wî şîn dibit” ji bo kesekê tê gotin kû hemû ji dîtin û axaftna bi wî ra acizin, lê diçin kîderê rastê wî tên.

“Pehîn li gora Hatem daye(*)” = bi tane ve ji kesekê mûn û xesîs ra dibêjin kû tişteke nehêja dibexşit

Divê tû goştî ji kêleka gayê bibirî”= divê ji kesên dewlemend û dara xêr û sûd dît, ne ji destteng û hejaran.

“Gayê enî beleke”her kes wî dinasit.

“Çêla wî zaye” = bûyerek serê wî da hatiye û ketiye nava xerc û zehmetê .

“Çû cihekê kû yê Erebb leven avêtê” =ji tirsê canê xwe çû cihekê dûr û hat tunekirin, yan jî çû cihekê kû êdî vegera wî nîne.

“Çûm qenciyê bikim lê ez bûm kebab” = min xwest qencî û başiyekê bikim, lê tûşî derdeserê bûm.

“Hatem Taî yek ji dewlemendên Erebbiye kû di bexşendeyî û destgirtina hejar û lê qewawan da gelek hêja û binav û deng bûye. (wergêr)

“Rûviya rast di zikê wî da peyda nabit”= gelek direwkere, çî car gotina rast ji devê wî demakevit.

“Tû zêrî danî ser polayê, wê nerm bikit” bi pere û xelat danînê, her mirovekê serhşik û giran tê nerm kirin.

“Ser û guhek li avê dayîn” lêgerîn kirin li ser kar yan cihekê.

“Seyê zer, birayê tûriye”= Jibo dû kesan tê gotin kû herdu rezil û ketî bin.

“Şah dibexşit, lê Şêx Elîxan nabexşit” = xweyê mal dibexşit, lê kesekê di pêşgir û neraziye.

“Şev avise ka wê çî bizê spêde”= bûyerek liber qewumîmê ye, lê serencam û dawiya wê nezelale..

“Hêştir wunda kiriye, li pey hefsarê wê digêrit”= tiştê mezin jidest çûye û ew ketiye pey hûrmûrkan.

“Hêştira stû dirêja malêye” = Guhê wê ji qerebalixê tejiye. Ji vê hing û ding û pir dengiyê, ji meydanê dernakevit.

“Mêrê min tûrîbit, nanê min di sufrê de bit” = Ji wan jinan re tê gotin kû ji mêrê xwe hesnakin û bes pere û dewlemendiya wî dixwazitn.

“Ger ka ne ya teye, kadîn ya te ye” Ji bo kesê kû li ser sufreyê dîtiran dirûnit û hinde zêde dixut ta nesax dibit.

“Xwehr û hinû minû” = Danûstandineka borandinî, danûstandineka kû ne wî ji xwe birevînin û ne jî tam bixwe ve girêbidî.

“Kêç ketiye piyê wî” = Bê oqire û hedare.

“Fîlê zindî hezar tomane û miriyê wî jî hezar tomane” = Ji bo kesên mezin kû şkestin û

bêmirazî, ji qedir û bihayê wana kêr naket.

“Elî maye û hewza wî” = Her tiştê xwe ji dest daye.

“Ger Xudê bixwazit, dijmîn jî wê bibit sedemê xêrê” = Carna hewl û neyariya dijmîn bi sudê mirov temam dibit.

“Serencama wî bi serencama Yezîd dimînit” = Ji bo kesekê kû serencama karê wî rureşî û ketin û pûç bûne.

“Zamin yan dest li berîkê ye, yan dest li yaxe” = Kesekê kû dibi zamin, yan divê pere ji berîka xwe bidit, yan jî bi şer û li hevketinê re rûbirû bimînit.

“Sabûna wî bi cilê her kesê ketiye” = Her kes xapandiye, ziyan û şerê wî ghiştiye her kesê.

“Dew û doşav ji bo wî yeke” = Di navbara başî û xirabiyê de cuydabûnekê nizanit.

“Dûrî û dostî” = Ya baş ewe ji hev durbîn, ta dostaniya me parastî bimînit.

“Derya bi devê seyê nalewitit” = kesê kû camêr û şerîf bit, bi bedgoyî û fesadiya her sûtarekê bednav û sivik nabit.

“Devê dîzikê vekirîye, şerma kêtikê kûve çûye” = Ji bo kesekê kû ji reftarê qenc û xûyê başê dîtiran, bervajî sûd digrit.

“Di mala mêriyê de, sevnemek tûfane” Zîyan û tengavî jibo kesê nedar û lawaz her çiqas kêr jî bi li wî giran têt.

“Ger di malê de kese, peyvek bese” (*) = Kesê zana û zîrek bi gotinekê têdigeht.

(*) Kurd dibêjin; “Kesê kese herfek bese” (Wergêr).

“Av ji aşî ket” = ew hemû deng û gêre û qerebalix dawî lêhat.

“Mirovî şîrê xav xwariye” = dibi kû her kes şaşitî û hîleyê bikit.

“Can nadete Îzraîl” = Gelek çavteng û destgirtiye. “Kêr destikê xwe nabirit” = Mirov eşandin û ziyanê nagehînit kes û kar û derdorê xwe.

“Çirayê ji malê ra pêdivî, ji mizgeftê ra herame” (1) = Heya kû kesû kar û nêzîkên te pêdiviyê arîkariyêne, pêwîst naki li dûrtir bigerî.

“Hacî mir û hêştir felît” = Mirovê bê wijdan û çavteng mir û derdorê wî ji êşandinên wî rizgarbûn.

“Hesab, hesab, kekû bira” (2) = di meselên sûd û kirîn û firotinê da, divê mirovînî û dostaniyê bidî milekê.

Kurd dibêjin; “Berika ji malê ra fer ji mizgeftê ra herame”

Kurd dibên; “Bira biranî, bazar cudanî” .

“Ev ne denê rengrejanê hema lê bidî û derbêxî” = Di bersiva kesekê da tê gotin kû jibo dawî lê hatina karekê, zûtir ji wextê wê yê asayî mukuriyê biket.

“Qazana şîrîkiyê nakelit”= Jibo karekê kû çend kes tê da şîrîk bin û jiber nakokî û nêrînên cuda berhemekê baş nadete dest .

“Dûşav li serê kesekê dayîn”= Bi sozdaneka direwînî bela kesekê ji xwe vekirin .

“Silava yê gundî ne ji xwe da ye”= Yê kû şîrînzimanî û methê te dike, bizane daxwazeka wî heye .

“Kaçî baştîre ji hîçî”= Tiştêk çendî kêr jî, ji hîçîyê baştîre.

“Kêr bixwe û xulaman bigire”= Jibo kesekê kû bê sedem emir û fermanan didete dîtiran .

“Hertim heştî wî di rehîmê neha wî da ye”= hertim deyndare .Deramedê wî têra mezaxtina wî naket.

“Kêra aşpezxanê ye” = Bi kêrî her karekê têt.

“Karê kû çav dike, birh nake”= Her kes pêbûyê karekê ye .

“Kasibî, ka mehandîne”= Di kar û kasibiyê da divê sûd û xêrên herî kêr ji berçav bigirî.

“Çi bikim sînîk bidet girtin”= Hertim di şik û gumanê da bûn ji bextê xwe gilî û gazind kirin.

“Kase û kûze di serê kesekê da şkandin”= Herçend bêgunche jî, lê hemû binasan dêxin stuwê wî da .

Gotinên Pêşyan Di Çanda Gelan Da

“Xwezî tû cêmik bûyiya”= Gelek tamsar û bêxweyî

“Kewê wî wek dîkilî distirê”= Gelek dilşa û keyfxweş .

“Serê çûkê xwariye”= Gelek pîrbêj û têraxaftine .

“Kolana lihev hatinê”kolanek zor teng kû tê dadûkes bi zorê ber hev ra bibûrin .

dû kes bi zorê berhev ra dibûrin

“Gayê bê şax û dûve”= Gelek nezane .

“Wextê gapîrbû, golika wî eziztir dibit”= Jibo kesê kû di pîriyê da zêdetir ji zarokên xwe hezdike

“Di lêbûrinê da, veger tune”= Tiştê hatî bexşîn, nayê standin

“Hezar mar xwariye, ta bûye efitî”= zor zîrek û kêrhatîye

“Heft kifin rizandin”= Gelek ji mêjveye miriye .

“Hem ben qetîya û hem dok şkest”= Êdî dubare çêkirin û ser hev ve anîna wê negengaze.

“Hîç pişîkek di rêya Xudê da mîşkan nagirit”

=“Her kes jibo berjewendiya xwe karekê dike .

“Hîç miriyek evqas paqij neşuştibû”= Bi her kesê ra neqenc û bedreftar bû û ev cara yekêye kû qenciya vi digehit kesekê .

“Yan zengîyê Zengbe, yan Romiyê Romî” = Li ser rê û nêrînekê seqamgîr û yekreg be .

“Ma kozîka rêgirane”= Diziya evqas eşkere û vekirî !

“Ma em diçîne serê dîzîka rûnî”= Ma xêre kû sibeha evqas zû biçîne mala wî !

FERHENGOK

A

asûde = tena ,rehet .

aşpezxane= cihê xwerin pehtinê, (metbex)

B

behitîn = şaşman, sersurman, sersam bûn

bûzîne = lawurek ji melbata gamêşan

bez= duhnê pezî, çewrî

bedgoyî= xirab axaftin, zimanpîsî, (fesadî)

binas= (sûc, xeta)

bexşîn= ji kerema xwe dayîna tiştekê .

C-Ç

cêmik = cêwî, dû qulû, dû zarok yan ji dû tişên wekhev

cinn = meçîtirk,(ecinnî)

cilêt = devîk, mûs, devamûs.

Çêlek = çêl,manga

D

daûran = daqurtandin

difîn = kep, poz lût, kepû

Gotinên Pêşyan Di Çanda Gelan Da

“Dost bigire belespêk, berî mede beespêks
dostê xwe bi qespekê bikirê, lê bi hespekê Ji destê xwe
neke .

delîve= derfet, (furset)

didan= diran, dan

dadwerî = karê dadmandiyê kirin, qazî bûn

daye = jina kû şîr dide zarokekê dî û wî xweyî dike

dojeh = berzex, (cehennem)

dergûş = landik, bêşke, mehdik

dirêşûnk = Çûzere, derziya kû mar di rêya wê ra jehra xwe
dirijînit

debaxane = cihê kû tê da kevilê lawuran dişûn û jibo
karanînê amade dikan

dilniya = piştrast

dûng = dûvê mihê kû ji bezî pêkhatiyê

dendik = tûtvik, tuxm

dîtiran = yên dî, kesên dî

dû = dûman, dûkel, dûyê agirî

deramed = destkeft, destrenc,berhem

dok = amêrekê dezîrêsandinê

E

Efî= corek marê mezin û bi jehre

edet = dabû nerît

ewlad = role, keçû kurên dayîk û babekê

F

felîte= sûtâr, serserî, kolanî

G

gewc= kêmeqil, xeşîm

gelû = qirik, gewrî, hefik

geybet = di nebûna kesekê da behsê wî kirin

Gotinên Pêşyan Di Çanda Gelan Da

geybet = ne amadebûn

geyb = wunda, nediya

H

himbêz = bermil, bawêş

hevpaye = hevpile, hawta

hergîz = qet, hiç wext, (ebeden)

henek = tirane, galte, şûxî

hilû = xox

hena = xena

hewz = birka avê

I

insiyatif = destpêşxerî

iqrar = anîna ziman, derbirîn

îbadet = xudêperestî

îman = bawerî

J

Jimartin = hesab kirin

K

kirnûş = xwe tewandina bi rêzdarî ve (sucde)

kiras = (qemîs, gömlek)

kurî = dûv, kilik

keyfer = encama xirabiyê

kêlek = tenîşt, rex

kefçe = kefgir, komçe

M

mûn = çavteng, destgirtî, çawçinok

mencelok = bêrdoş, sîtila şîrdotinê

mandî = westay

Gotinên Pêşyan Di Çanda Gelan Da

mîfa = sûd, (fayde)
mexîn = nevîn, neyar
mirût = (moral)
misoger = sedî sed, bêguman
meyl = hezkirin, viyan
midîtî = talan, destkeftêkê bêzehmet
mukurî = pêdagirtin, (israr)

N

negengaz = neliwaw, ne (mumkin), çênebûyî
niyazmend = hewce, desteng (muhtac)
napesend = kirêt, neşîrîn
nargîl = gwîza Hindê
ne amade = ne li cih, ne (hezir)
natewan = bêhêz, lewaz
nanewa = fîrîncî

O

oqire = aramî, hedar

P

palûde = falûde, xwarinek sar û tezî wekû şorbeya bitincê
ye kû ji nişaste û şerbeta şekir û gulavê tê sazkin li havînê tê
xwarin .

pere = pare, pûl, dirav
pêşhat = bûyer, rûydad,
pertal = perok, kûtal, (qumaş)
parvekirin = behr kirin, dabeş kirin (teqşîm)

Q

qahîm = mukum, şidhay
qurme = xwerineke ji goşt û pîvaz û giya û .tê sazkin .

R

rehîne = giro, dest bi seda girtî
rengrêj = kesê kû hirî û sofû tiştên dîreng dike
rûvî = rîvîk, rîxole
reçaw kirin = berçav girtin, diyar kirin, dest nîşan kirin.
rezamendî = razibûn, bersiva erênî, pejirandin
rewuşt = reftar, dan û standin, (exlaq) xû

S

sextgîr = kesê di karê xweda mukur û jidile
sazigar = lihev hatî, lihev kirî
sirke = ava tîrşa tîriyê negehiştî
stirî = kelem, qelem, dirk
seulh = pêkhatin, aştî
seqamgîr = cih bûyî, rûniştî, paberca, (musteqer)
spehî = xweşik, cuwan rind, law, qeşeng
salve çûyî = salmend, extiyar, pîr
serinc = bal, (diqqet)
stiran = awaz gotin, awaz, lihev xistina hevîr yan heriyê
jibo tîrşbûn û hev girtinê
sûdmend = bisûd, bimifa
sanahî = asan, nezehmet .
serencam = dawî, (aqîbet)

Ş

şil = ter, av vêketina tişteke
şiyar = karîn, tuwanayî, hêzapêkanînê
şimşêr = şûr, (seyf)
şevnim = dilopên hûrên avê kû şevên zivistanan dikevin
ser belgê daran û tiştên dî

T

temen = jî, (umr)

Gotinên Pêşîyan Di Çanda Gelan Da

teba = lawur, (heywan)

tirsnak = bi tirs,talûke

teqwa = xwe ragirtin û parastin li hember her core
kiryareka neqenc

tevnepîrk = tevna dapîroşkê tevna (enkebût) ê

tune kirin = ji meydanê rakirin, kuştin

tûşbûn = rasthatin, girîftarbûn, têketin

tûrî = tûrg

W

wade = peyman, soz, jivan

X

xelîfe = cêgir, yê li pey wî,(tenah),tama

xesîs = gelek dest girtî

xure = tişteke kû tişteke dî dixwe û tunedike

xertûm = difîna fîlî kû wekû boriyekê dirêje

Y

yeksan = wekhev, beramber

Z

zamin = wekîlê kesekê yan karekê

zencî = reşpêst, reşik

Gotinên Pêşîyan Di Çanda Gelan Da